
ŞAREDARIYA BAJARÊ
MEZIN A AMEDÊ
JI CÎYÊ KU LÊ MANE
em bi hev re ava dikin
AMED
Bajarê Bîr û Evînê


AMED
Bajarê Bîr û Evînê


AMED
Bajarê Bîr û Evînê

# JI CIHÊ KU EM LÊ MANE EM BI HEV RE AVA DIKIN

Di hilbijartinên herêmî yên 31'ê Adarê 2024'an de, me bi piştgiriya %65 a gelê Amedê li 8'ê Nîsanê erênameyên xwe girtin û me mil dan hev da ku sozên ku me berî hilbijartinan dabûn gelê xwe bi cih bînin.

Îro, em ê wêrankariyên qeyûman a 8 salan û astengên bûrokratîk ku piştî hilbijartinan bi Giştînameya Tedbîrên Kêmkirina Mesrefan a Serokomariyê ku destê me girê daye, nexin rojeva xwe.

Bêyî ku em tu mahne û sedemê pêşkêş bikin, em ê tiştên ku me di salekê de kirine, yên ku me nikariye bikin û tiştên ku em ê di pêşerojê de bikin bi we re parve bikin.

Wekî şaredariya 12'emîn a bajarê mezin a Tirkiyeyê, bi bûdceya me ya 16 milyar TL ji bo sala 2025'an, em li ser 15 hezar 272 kîlometreçargoşe qada xizmetê ku 17 navçe û hezar û 47 tax dihewîne, bi 4 hezar û 150 karmendî xizmetê pêşkêşî milyonek û 843 hezar û 871 welatiyên xwe dikin.

Her çiqas li gorî serjimara nifûsê em şaredariya 12'emîn a bajarê mezin bin jî, ji aliyê rûbera erdê ve em di rêza 10'emîn de ne. Çima em vê dibêjin? Ji ber ku bûdceya ku ji Banka Bajaran ji bo şaredariyan tê veqetandin, li gorî rêjeya nifûsê tê hesabkirin. Lê belê rêveberiyên herêmî, di gel rêjeya nifûsê, di xizmet û projedanînên xwe de rûbera erdê jî esas digirin.

Bi gotineke din, Kocaelî ku nifûsa wê 2 milyon û 130 hezar e, bi para ku ji Banka Bajaran distîne xizmetên bingesazî û seresaziyê pêşkêşî qada 3 hezar û 397 metreçargoşe dike, em bi nifûsa milyonek û 843 hezar û 871 kesî, bi para kêmtir, xizmetê dibin qadeke 15 hezar û 272 kîlometreçargoşe.

Wek mînak, xeta şebekeya avê ya vexwarinê, xeta kanalîzasyonê û rêyên ku li bajêrê me kêm in, ji qada xizmeta Kocaeliyê gelek zêdetir in.

Ancax ji bo me prensîba bingehîn, paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinan a partiya me ye.
Bi tevgera li gorî van prensîban, em ji roja ku em hatin hilbijartin û pê ve bi hişmendiya pêşkêşkirina xizmeteke wekhev, dadmend û gihîştbar ji her takekesî re xebitîn. Em tu carî ji polîtîkayeke zelal û beşdarîdar a demokratîk a ku li ser agahiya pêbawer, şefafiyeta malî û hesabdayînê disekine, destberdar nebûn.

"Wek karê ewil, di çarçoveya Plana me ya Stratejîk a ku me bi awayekî berfireh û hûrgilî amade kiriye de, me kombûnên koman ên fokusê û nîqaşên berfireh bi rêxistinên civaka sivîl re li ser her mijarê têkildarî bajêr li dar xistin.

Di vê pêvajoyê de, me dawetname ji 1046 muxtarên taxan re şandin û dîtin û pêşniyarên wan girtin. Bi anketa "Bandora Xizmetan Li Ser Civakê" me serî li ramanên 2 hezar û 300 hemşehriyên xwe dan, bi piştevanên xwe yên hundirîn û derve re anket li dar xistin û bi daneyên ku me bi dest xistin, me armancên pîvanbar û berdewambar diyar kirin.

**Serra BUCAK - Doğan HATUN**

Hevşaredarên Bajarê Mezin ê Amedê

**AMED**

*Bajarê Bîr û Evînê*



# SEROKATIYA DAÎREYA XIZMETÊN JIN Û MALBATAN



Me polîtîkaya azadiya jinan ku bingeha fikra me ye, yek bi yek pêk anîn, pêk tînin.

- Di 6 Navendên Jiyana Jinan de 2500 jin ji 63 kursên pîşeyî yên 10 beşên cuda (cil, spor, kursa Quranê, ajnê û hwd.) sûd wergirtin.
- Bi hevkariya saziya me û rêxistinan, 63 xebatên perwerdeyê yên li ser bûdceya zayendî hatin kirin.
- Li Taxa Ben û Sen a ku me wek herêma pilotê bijartî, xebata qadê ya li ser xizaniya jinan hat kirin û daneyên nexşeya xizaniya jinan li pergala agahiyên bajêr hatin tomarkirin.
- Di çalakiyên 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Şideta li Jinan û 8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê de, me xwe gihand 8000 jinan.
- Ji bo hêsankirina jiyana rojane, 7000 jinên bê ewlekariya civakî JINKART'a belaş standin.
- Bi protokola Baroya Amedê re, piştgirî û şêwirdariya huqûqî ji jinên mexdûrên şidetê re tê dayîn.
- Navenda Lêkolîn û Pêkanîna Pirsgirêkên Jinên Amedê (DÎKASUM) piştî 8 salan dîsa dest bi xebatê kir, ji bo dîtina pirsgirêkên jinan ên ji ber newekheviya zayendî û pêşxistina projeyên çareseriyê.
- Me di projeya "Ji Edetê Ye Em Hilberînê Dikin" a li dijî xizaniya reglê de, li Taxa Ben û Sen kargeha pedên ku tên şûştin vekir, ji vê kargehê 166 jin sûdmend bûn û ji jinan re bû deriyê karê.
- Mala Şûştina Cilan a li Zanîngeha Dîcleyê ji nû ve dest bi kar kir û xizmeta şûştina cilan a belaş ji xwendekaran re pêşkêş kir. 8010 jin ji navendên me yên jiyanê û malên stargehê sûd wergirtin.
- Di çalakî, perwerde û xebatên hişmendiyê yên Serokatiya Daîreya Jinan de me xwe gihand 47.125 jinan.

# SEROKATIYA DAÎREYA XIZMETÊN MALÎ

SALA 1EMÎN DI XIZMETÊ DE

- Ji bûdceya mezaxtinan a 12 milyar TL, 8 milyar 672 milyon 105 hezar TL hat bikaranîn û gihîşt %72,27.
- Ji bûdceya xerckirina 2025'an a 16 milyar TL, di sê mehên pêşî de 1 milyar 803 milyon 352 hezar TL hat xerckirin ku dike %11,17.
- Dahata bûdceya 2024'an a 10 milyar 600 milyon TL, bi %85,74 hat pêkanîn û gihîşt 9 milyar 88 milyon 385 hezar TL.
- Dahata bûdceya 2025'an a 14 milyar 150 milyon TL, di sê mehên pêşî de bi %16,73 gihîşt 2 milyar 366 milyon 892 hezar TL.
- Di navbera Nîsan-Berfanbara 2024'an de, 208 milyon 618 hezar 655 TL ji wasiteyên Şaredariya Bajêr a Mezin û bi parên otobusên taybet, bi tevahî 217 milyon 476 hezar 118 TL dahat hat tomarkirin.
- Di sê mehên destpêkê yên 2025'an de, 30 milyon 518 hezar 126 TL ji wasiteyên veguhastina giştî ya Şaredariya Bajêr a Mezin û bi parên ji otobusên taybet, bi tevahî 37 milyon 568 hezar 322 TL dahat hat bidestxistin.

## SEROKATIYA DAÎREYA KARÊN NIVÎSÊ Û BIRYARAN

- **Bi axaftvanên koma Meclisê re 56 civîn hatin kirin û 393 biryar hatin girtin.**
- **44 pêşniyar ji bo Civîna Meclisê hatin amadekirin.**
- **Meclisê 13 biryarên betalkirina terxankirinên ku qeyûman şandibûn, girtin.**

## SEROKATIYA DAÎREYA PÊŞXISTINA ÇAVKANIYAN

- Me di mulkên şaredariyê, kar û bar, beşdarî û kirêyan de zêdebûnek %380 li gorî sala berê çêkir.
- Me dahata ji Borsa Heywanan, Otogarên Navçeyan ên Rojava û Rojhilat, Otogara Bajêr û parkînga wê, Otogara Bismilê, kirêya mulkan û stasyonên bingehîn, ku salek berê 23 milyon 545 hezar TL bû, derxist 56 milyon 945 hezar TL.

## SEROKATIYA DAÎREYA ETÛD Û PROJEYAN

- Serokatiya ku di warên Guherîna Hawirdor û Avhewayê, Xizmetên Tenduristî û Civakî, Parastina Mîrateya Çandî, Çandinî û Pêşveçûna Gundewarî, Veberhênanên Veguhestin û Binesaziyê, Hevkariya Navneteweyî û Çavkaniya Darayî de hewlên giran dide; di projeyên bi prestîj ên wekî Projeya Pergala Rêhesinê ya Sivik, Projeya Jeotermal a Çarîklî û Muzexaneya Bajêr de pêşengiyê dike.

# SEROKATIYA DAÎREYA XIZMETÊN CIVAKÎ

- Di Kreş û Malên Lênêrîna Bi Roj a Zarokistan de 360 zarokan bi çend zimanan perwerde girtin.
- Di beşdariya Karta Piştgiriya Civakî de di 2024'an de ji 23.935 malbatan re 23 milyon 935 hezar TL, di Adara 2025'an de ji 3000 malbatan re 9 milyon TL, bi tevahî 32 milyon 935 hezar TL hat dayîn.
- Ji 5260 xwendekarên ku cara yekem li zanîngehê qeyd bûn, 78 milyon 900 hezar TL alîkariya belaş hat dayîn.
- Di 2024'an de ji 11 malbat, di 2025'an de ji 9 malbat, bi tevahî ji 20 malbatên hewcedar re 420 hezar TL alîkariya pere hat dayîn.
- Di meha Remezanê de li 4 cihên cuda, 188.500 kesan xwarina îftarê xwarin.
- Di Banka Cilan de 2423 parçe cil ji 1124 kesan re hatin dayîn.
- Ji bo jinên li Amedê ku nû zarok anîn, 3000 "Pakêta Piştgiriya Zarokên Nû" hat hazirkirin.
- Li 6 cihên cuda yên bajêr ku kaniyên xêrê lê hene, şorbe û şerbet ji 190.000 kesan re hat dayîn.
- Ji malbatên hewcedar ên 17 navçeyan 955 koliyên xwarinê hatin belavkirin.
- Ji malbatên zehmetî dikşînin re piştgiriya derûnî, xizmeta civakî, perwerde û şêwirdarî hat dayîn.
- Di Navendên Fêrbûna Dirêjahiya Jiyanê de, ji 19 beşan rojane 165 kesan perwerdeyên pîşeyî girtin.
- Ji çalakî, perwerde, festîval û şahiyên ji bo zarokan 17.658 zarok sûdmend bûn.
- 170 xwendekar di xaniyê xwendekaran a me ya 391 nivînan de dimînin.
- Mêvanxaneya me ya 87 nivînan bi hemû hêza xwe xizmetê dide nexweş û malbatên wan.

# SEROKATIYA DAÎREYA XIZMETÊN ASTENGDAR Û PÎRAN

SALA 1EMÎN DI XIZMETÊ DE

- Ji 580 pîrên tomarkirî, 160 kes ji wan bi tenê dijîn, bi tevahî ji 290 kesan re xizmeta lênêrîna malê hat dayîn. Di meha Remezanê de serdana 600 malbatan hat kirin û 200 koliyên xwarinê hatin belavkirin.
- Ji 176 kesên astengdar re xizmeta tenduristî û lênêrîna kesane ya malê hat dayîn.
- Ji 485 kesan re kursiyên bi batarî û yên bi dest, ji 685 kesan re alîkariya amûrên bijîşkî, ji 600 kesan re xizmeta tamîr û lênêrîna amûran hat dayîn.
- Destpêkirina perwerdeya "Bikaranîna Tevgera Serbixwe" ji bo kesên bi astengdariya dîtinê û 200 gopalên spî hatin belavkirin.
- Ji 45 fêrkarên Navenda Otîzmê, 5 rojên hefteyê perwerdeyên sporê hat dayîn.
- Projeyên Taksiya Civakî ji bo nexweşên penceşêrê ku hejmara wan digihêje 20 hezar kesan dest pê kir da ku xizmeta di navbera mal û nexweşxaneyan de bide û heya niha 71 kesan sûd ji vê projeyê wergirtiye û bi tevahî 710 xizmetên nexweşxaneyê hatine dabînkirin.
- Ji 3052 kesên astengdar re xizmeta veguhastinê ya belaş hat pêşkêşkirin.
- Studyoya tomarkirina dengî, piştî 8 salan ji nû ve hat tamîrkirin û "Projeya Pirtûkxaneya Dengî" ku kesên bi astengiya dîtinê jê sûd werdigirin, hat pêkanîn.
- Ji 981 kesên astengdar re di bernameyên perwerde û hobiyê yên li Navenda Jiyana Çalak de xizmet hat dayîn. Ji bernameyên xizmetên civakî jî 1600 kesan sûd wergirt.
- Bi xizmeta şêwirmendiyê ya ji bo nexweşên Çolyakê re, alîkariya xwarina bê gluten ji 1210 kesan re hat pêşkêşkirin. Dema ku 981 kesên astengdar li Serokatiya Daîreya me qeyd bûne, ji bo xizmeteke berfirehtir dest bi xebatên ji bo "Projeya Nexşeya Astengdaran" hat kirin.
- Bi lidarxistina "Atolyeya Siyasetên Astengdaran û Pêkanînên di Rêveberiyên Herêmî de", Rêya Siyasetên Astengdaran bi civaka sivîl û saziyên dewletê yên ku di vî warî de dixebitin, hat xêzkirin.
- Ji 2405 kesan re xizmeta şêwirmendiya psîkosivakî hat dayîn.

# SEROKATIYA DAÎREYA XIZMETÊN TENDURISTIYÊ

- Li 17 navçe û 1046 navend xebatên dermankirinê hatin meşandin.
- Ji bo parastina tenduristiya gel, di kontrolkirina 10 hezar cihên kar de 5 ton û 157 kîlogram berhemên ku dema bikaranîna wan derbas bûye, hatin rakirin.
- Di Mala Lênêrîna Heywanan de lênêrîn û xwedîkirina 550 canên bi pençik (400 kûçik, 150 pisîk) û tedawî û rehabîlîtasyona 6830 heywanan hat pêkanîn.
- Di kontrolên Navenda Tenduristiyê ya ku bi hevkariya Şaredariya Baxlarê hatiye avakirin de, 4950 hemwelatiyên me ji xizmeta tenduristiyê ya belaş sûd wergirtin.
- Li bajêr, ji bilî 3806 xizmetên defnê, 9047 xizmetên veguhastina cenaze jî li derveyî bajêr û navçeyan hat dayîn. Herwiha li navçeya Sûrê, li Taxa Kabiyê, di erdekî 588 hezar metreçargoşe de dest bi avakirina qada goristaneke nû hat kirin.

# SEROKATIYA DAÎREYA ÇAND Û KARÊN CIVAKÎ

SALA 1EMÎN DI XIZMETÊ DE

- Bi beşdariya şanoyên neteweyî û navneteweyî, 9'emîn Festîvala Şanoya Amedê û şano û festîvalên ji bo zarok û ciwanan hatin lidarxistin. 25.260 kesî li şanoyan temaşe kirin.
- Di Festîvala Fîlmên Kurt a Navneteweyî ya Çewlîka Vegan de 10 fîlm hatin nîşandan.
- Ji bo zarok û mezinan, di nav 3 mehan de bêpere "Rojên Fîlmê yên Sînebîr" hatin lidarxistin.
- 14.290 kesî li pêşandanên sînemayê temaşe kirin.
- 125.750 welatî beşdarî guhdarîkirina helbest û muzîk û konserên me yên li cihên cuda yên bajêr bûn.
- Di çarçoveya şaredariya pirzimanî de, xebat ji bo kursên zimên û "Termînolojiya Şaredariyê" dest pê kir.
- 550 kesan ji kargehên konservatuarê û xebatên din ên perwerdeyê sûd girtin.
- 3'yemîn Festîvala Fîlman a Amedê dest pê kir.
- Di havînê de, li Navenda Çandê Çand Amed, 17 cure kursên hunerî (muzîk, şano, wênê...) ji bo zarok û mezinan vebûn.
- Şaxa Parastin û Pêşxistina Zimanî vebû û di Hefteya Zimanê Dayikê ya 21'ê Sibatê de li kar û bazaran belavok, etîket û nîşanên sîngê hatin belavkirin.
- 95.300 kesan serdana Mala Dengbêjan kir.
- Mêvandariya Pêşangehên Turîzm, Pirtûk û Gastronimoyê yên Neteweyî û Navneteweyî hat kirin.
- Bi hevkariya UCLG-MEWA, mêvandariya sempozyûmeke du rojan hat kirin ku 30 şaredariyên bajarên mezin ên neteweyî û navneteweyî beşdar bûn.

# SEROKATIYA DAÎREYA PARASTINA JÎNGEHÊ

- Tevî ku paqijiya bajêr, ji bilî kuçeyên sereke, ya şaredariyên navçeyan e jî, piştî hilbijartinan, bi koordînasyona ku me bi şaredariyên navçeyên navendî re ava kir, xebatên me ji bo bajarekî paqijtir berdewam in. Di vê çarçoveyê de, bi kampanyaya "Ez Ji Amedê Hez Dikim, Qirêj Nakim" gelek çalakî hatin lidarxistin.
- Di çarçoveya xebatên şopandin û çavdêriya kolandinê de, 1 milyon 45 hezar 525 metreçargoşe ax hat rakirin û ji vir 11 milyon 713 hezar 565 TL dahat hat bidestxistin.
- Rojane 1400 ton bermayî tên birin Avahiya Tevhevkirî ya Bermayiyên Hişk û mehane 4.6 MW enerjî ji bermayiyan tê bidestxistin. Di sala dawî de 67 milyon 466 hezar TL dahat hat bidestxistin.
- 1400 qutiyên gelewazî yên çopê li kuçe û baxçeyan hatin bicihkirin.
- 4000 qutiyên çopê li kuçeyên bajêr hatin bicihkirin.
- Ji bo parastina dîmena çandî ya Çemê Dîcle û Baxçeyên Hewselê, kontrolên berdewam hatin kirin.
- Di encama kontrolên Bermayiyên Bijîşkî de, di sala dawî de 2 milyon 361 hezar kîlogram bermayiyên bijîşkî hatin sterilîzekirin û rakirin, 14 milyon 285 hezar TL dahat ji bo bûdceya şaredariyê hat tomarkirin.
- Ji 254 hezar 883 KW elektrîka ku ji Santralên Enerjiya Rojê ya Sumerpark hatî hilberandin, 1 milyon 299 hezar 500 TL dahat hat tomarkirin.
- Ji Santralên Enerjiya Rojê ya Otogarê 356 hezar 400 KW elektrîk hat hilberandin û 1 milyon 805 hezar dahat hat bidestxistin.
- Li Santralên Elektrîkê ya Mala Rojê, perwerde li ser enerjiya nû, guherîna avhewayê û sifir bermayî ji xwendekarên seretayî, navîn, lîse û zanîngehan re hat dayîn.

# SEROKATIYA DAÎREYA GUHERÎNA AVHEWAYÊ

- Wek gava yekem a veqetandina li çavkaniyê, qutiyên nûbikaranînê li hundirê saziyê hatin danîn û sepandin bi şaredariyên navçeyan û hemû saziyên giştî re tê belavkirin.
- Li seranserê bajêr dest bi komkirina rûnê bermayî hat kirin û di heyamê 3 mehan de 20 ton rûnê bermayiyê şînber hat komkirin û rakirin. Herwiha, bi armanca belavbûna kampanyayê, li hemberî 5 lître rûnê bermayî, 1 lître rûnê paqij tê dayîn.
- Xebatên Dibistana Avhewaya Arkeolojîk nêzî temambûnê ne û bi pirtûkxaneya tovê ku li wir hatiye avakirin, arşîvkirina tovên herêmî hat pêkanîn. Dibistan ji mêvanan re vekirî ye û perwerde bi armanca hişmendiya guhertina avhewayê û ekolojiyê tê dayîn.
- Bi civîneke ku bi beşdariya berfire ya kes û saziyên ku bi cotkariya çalak re mijûl in li seranserê bajêr hat lidarxistin, dê rêya çandinî û xwedîkirina heywanan bê diyarkirin.

# SEROKATIYA DAÎREYA PARK Û BAXÇEYAN



- 2 milyon 780 hezar kulîlkên demsal ên ku me di guldankên xwe de mezin kirine, hatin çandin.
- Li deverên ku dikevin ber berpirsiyariya me, 8360 dar hatin çandin.
- Li deverên ku dikevin ber berpirsiyariya me, 30 hezar 270 şitil hatin daçikilandin.
- 15 hezar tovên darên hevrizê ku ji gozikên çaman hatine bidestxistin, hatin çandin.
- Li qadên me yên nehalê, 15 hezar gul hatin berhemanîn.
- Li çarrêyan û refûjên navîn, sepandina dîmena ziwa hat kirin ji bo parastina çavkaniyên me yên avê.
- Li seranserê bajêr 72 hezar dar û ber hatin kezaxtin.
- Li qadeke 555 hezar metreçargoşe paqijkirina giyayên bejî hat kirin.
- Çînkirina çîmenê li qadeke 2 milyon 700 hezar metreçargoşe hat kirin.
- Li gorî hewcedariyan, li park û baxçeyan kêmasiyên wek amûrên lîstikê, qutiyên çopê, maseyên geşt û gerê hatin temamkirin. Di çarçoveya van xebatan de li 32 parkan, li qadeke 3 milyon 925 hezar metreçargoşe lênêrîn û tamîrkirin hat kirin.
- Li Fîskayayê rêkûpêkiya dîmenê hat kirin.

# SEROKATIYA DAÎREYA XIZMETÊN GUNDEWARÎ

- Bi dirûşma em dibin ava heyatê ji bo gundewar,
- Bi tevahî 80 hezar 880 metre kanalên avdanê yên girtî û vekirî hatin çêkirin. Di vê xebatê de 5067 cotkarî sûd wergirtin û 18 hezar 635 dekar erdê çandiniyê gihîşt avê.
- Ji bo 3 projeyên cuda bi tevahî 75 milyon 940 hezar TL hat veberhênan.
- Lênêrîna 14 golên avê yên vexwarina heywanan hat kirin. Bi vê xebatê 66 hezar 200 heywanên 4720 xwedîkiran û 5110 dekar erdê çandiniyê gihîştin avê.
- Beşdarî 15emîn Pêşangeha Çandinî û Xwedîkirina Ajelan a Mezopotamyayê hat kirin.

# SEROKATIYA DAÎREYA XIZMETÊN GUNDEWARÎ

- Bi projeyên rawestgeha jîr, agahiyên veguhastinê yên demî bi rêwiyan re hatin parvekirin.
- Bi damezrandina Navenda Kontrola Trafîkê, herikîna trafîkê hat kontrolkirin.
- 200 Pergalên Agahdarkirina Rêwiyên Hundirê Otobusê û Ragihandina Astengdaran hatin sazkirin.
- Di çarçoveya protokola ku bi otobusên gel re hat çêkirin, pirsgirêkên 30 salî yên di veguhastina rêwiyan a belaş de bi kûrahî hatin çareserkirin.
- Di çarçoveya protokolê de, dê %20 şofêr jin bin.
- Wek çareseriyeke demkurt ji bo pirsgirêka veguhastinê ku salan e veberhênan lê nehatiye kirin, di destpêkê de 14 otobusên rêwiyan û di nava salê de 49 otobusên rêwiyan hatin kirîn. Armanca me ew e ku bi 80 wesayîtan veguhastina giştî ya hundirê bajêr rehet bikin.
- Lênêrîna otobusên rêwiyan a ku salan e hatiye paşxistin, hat kirin û di nava salê de 5426 tamîr, lênêrîn û çakkirin hat kirin.

# SEROKATIYA KOORDÎNASYONA RÊYAN Û BINESAZIYÊ

- Li taxên gundewarî yên 17 navçeyan, bi tevahî 577 kîlometre rêyên asfaltkirî hatin çêkirin.
- Li navçeyên navendî 20 kîlometre rêyên duble yên çar û şeş xet hatin vekirin.
- Bi tevahî 210 hezar ton asfalta betonê hat belavkirin, 160 hezar ton li navenda bajêr û 50 hezar ton li rêyên gundên 17 navçeyan.
- 285 hezar metre çargoşe xebatên peyarê û parkeyan hatin kirin.
- Di çarçoveya têkoşîna zivistanê ya li dijî berfê ya li seranserê bajêr de, li 3 hezar û 600 kîlometre rêyên ku hatin girtin, bi navînî 8 milyon metrekûp berf û hezaz hatin paqijkirin.





# SEROKATIYA DAÎREYA ZABITEYAN

Me polîtîkaya azadiya jinan ku bingeha fikra me ye, yek bi yek pêk anîn, pêk tînin.

- Ji bo veguhastineke rehet û mirovane, li 22 hezar 500 mînîbusên bajarî, 19 hezar 300 otobusên gel ên taybet, 28 hezar 800 taksiyên bazirganî, 1750 servîs, 15 hezar 200 mînîbusên navçeyan, 8 hezar 300 otobusên navbajêr kontrol hat kirin. Sepandin li ser kêmasiyên ku hatin tespîtkirin hatin meşandin.
- 5650 cihên kar li otogara bajêr û navçeyan hatin kontrolkirin.
- Ji aliyê ekîbên me yên kişandinê ve li wesayîtên li rawestgehan, derbasbûnên peyayan, peyarêyan, rampên astengdaran û rêyên bisîkletan sekinî ne kontrolkirin hat kirin û cezayên pêwîst ên qanûnî hatin meşandin.
- Li ser otobusên veguhastina giştî kontrol hat kirin li ser klîma, rêwî daxistin-siwarkirina derveyî rawestgehan, neheqiyên li hemberî rêwiyên belaş, bikaranîna kursiyên astengdaran û taksîmetre.
- 6360 cihên karî li bajêr hatin kontrolkirin û li ser dagirkirina deverên giştî wek peyarêyan kar hat kirin.
- Mudaxele li 101 deriyên nerewa yên li bajêr hat kirin û 25 ji wan hatin hilweşandin.
- 4850 cihên kar li bajêr hatin kontrolkirin û ji bo 132 saziyên ku berhemên dema bikaranîna wan a dawî derbas bûne hebûn, kar hat kirin.
- Ekîbên me yên zabitaya turîstîk rêberî ji 7200 turîstan re kirin.
- Dagirkirina li Mizgefta Hezretî Suleyman û li Keleha Navîn hat qedandin.

# SEROKATIYA DAÎREYA CIWAN Û SPORÊ

Me polîtîkaya azadiya jinan ku bingeha fikra me ye, yek bi yek pêk anîn, pêk tînin.

- Navenda Etûdê ya Lîseya Akademiya Sûrê ya me mehane 7 hezar û 800 xwendekar jê sûd wergirtin.
- Mehane 900 xwendekar ji 27 lîstikên hiş û zekayê yên ku li cîhanê bûne trend sûd wergirtin.
- Di polên me yên Kodkirina Robotîk de 438 xwendekarî perwerde dîtin.
- Hefteyê 4 hezar hemwelatî ji kursên me yên werzîşê yên havîn û zivistanê sûd wergirtin.
- Pêşbirka Gel a Newrozê ya Yekemîn a ku me îsal cara yekem li dar xist, hezar û 500 kes beşdar bûn.
- Di çarçoveya têkoşîna li dijî xizaniyê de ji malbatên kêmendam re hezar û 500 çente hatin belavkirin.
- 2 hezar û 656 werzişvan ji alîkariyên pereyî yên ku ji klûbên werzîşê yên amator re hatin kirin sûd wergirtin.
- Tîma me ya voleybolê lîg di rêza 3'yan de qedand.
- Tîma Voleybolê ya Jinan a Ciwan a Klûba Sporê ya Şaredariya me bû yekemîna bajêr.
- Tîma me ya futbolê ya mêran lîg wekî lîder qedand û derket Lîga Super Amator.
- Tîma me ya futbolê ya jinan garantî kir ku di komên play-offê de cih bigire.
- Piştgirîya amûrên tîmên binesaziyê hat dayîn.
- Tîma me ya hentbolê ya mêran a ku di lîga 2'yan de têdikoşe, mafê derketina lîga 1'an bi dest xist.

# SEROKATIYA DAÎREYA ZANYARÎ Û TEKNOLOJIYÊ

- Binesaziya xebatên e-Şaredariyê qism bi qism tê amadekirin û xizmetê dike.
- Li Keleha Navîn, Meydana Şêx Seîd û Termînala Otobusê ya Navbajaran xizmeta WÎ-FÎya berfireh û belaş hat dabînkirin.
- Di çarçoveya Stratejiya Bajarên Aqilmend û Plana Çalakiyê de Sîstema Agahdariya Bajêr hat nûkirin.
- Me bi Sîstema Rêveberiya Arşîva Dîjîtal şaredariya xwe ewle û gihîştbar kir. 2 milyon û 858 hezar û 307 belgeyên şopandinê hatin temamkirin û derbasî sîstemê hatin kirin.
- Ji bo ku Serokatiya Agirkujiyê bi kar bîne Sîstema Agahdariya Paqijkirina Bixêriyan hat bipêşxistin.
- Ji bo ku gihîştina hêsanî ya warên turîzm û çandê were peydakirin Sîstema Agahdariya Bingehîn a Daneyên Erdnîgarî hat avakirin.

# SEROKATIYA DAÎREYA AGIRKUJIYÊ



**Me polîtîkaya azadiya jinan ku bingeha fikra me ye, yek bi yek pêk anîn, pêk tînin.**

- 21 wesayîtên ku ji aliyê agirkujiyê ve bi lezgînî hewce ne hatin kirîn û 281 milyon û 320 hezar TL hat dayîn.
- Bi sazkirina pergala telsîzê ya agirkujiyê 306 hezar TL hat xerckirin.
- Ji bo wergirtina 75 karmendên ku li gorî avahiya fizîkî û zêdebûna nifûsa bajêr hewce ne, pêvajoya qanûnî hat destpêkirin.
- Tîmeke lêgerîn û rizgarkirinê ya profesyonel a 40 kesan hat avakirin.
- Tîmeke avjeniyê ya 10 kesan hat avakirin.
- Kêmasiyên valahiya lûleyên vemirandina agir, amûrên parastina ji agir, cil û berg û yedek parçeyên amûran hatin rakirin.
- Perwerdeya Ewlehiya Agir ji 50 hezar xwendekaran re hat dayîn.

# SEROKATIYA DAÎREYA KARÊN FENÎ

Me polîtîkaya azadiya jinan ku bingeha fikra me ye, yek bi yek pêk anîn, pêk tînin.

- Çêkirina salona werzîşê ya girtî ya hezar kesan û hewza nîv-olîmpîk li navçeya Baglarê temam bû.
- Çêkirina hangarên agirkujiyê li navçeyên Hezro, Gêl, Çinar, Licê û Farqînê temam bû.
- Li navçeyên Çermûg û Çingûşê qadên çalakiyên werzîşê hatin çêkirin.
- Kêmasiyên lênêrîn-tamîr, çaksazî û nûvekirinê yên gelek yekîneyên girêdayî sazûmanê hatin rakirin.
- Di gelek çalakiyên wekî park, baxçe, peyarê û rêyên li qadên berpirsiyariya şaredariyên navçeyan de piştgirî hat dayîn.
- Sehneya Amfî Tiyatro ya Sumerparkê ya ku hatibû terikandin, ji nû ve hat sererastkirin û çalakkirin.
- Qada Şitildanînê ya Yenîşehîrê ya ku bêkêr hatibû hiştin ji nû ve hat vekirin.
- Li Baxçeyê Milet yê li navçeya Yenîşehîrê ji bo xwendekaran salonên xwendinê û pirtûkxane hatin avakirin.

# SEROKATIYA DAÎREYA ÇAPEMENÎ, WEŞAN Û TÊKILIYÊN GEL

- Ji bo ku biryaran li kolanê bigirin û bi gel re çareseriyê hilberînin, li hemû parkên bajêr bi hemwelatiyan re hevdîtin hatin kirin. 33 çalakî hatin kirin, wekî serdanên malan ên ji nişka ve, hevdîtinên muxtaran, serdanên esnafan, serdanên taxan û hevdîtinên çapemeniyê.
- Daxwazên ku ji hemwelatiyan hatin, ji Navenda Çareseriya Li Cih û Navenda Banga Alo 153 re hatin şandin, yekser ji yekîneyên têkildar re hatin şandin û çareserî hatin hilberandin. Yekîneya me ya Çareseriya Li Cih 19 hezar û 550 daxwaz wergirtin, dema ku 239 hezar û 248 daxwaz, pêşniyar û gilî li ser xeta Alo 153 hatin nirxandin.
- Hemû çalakiyên me yên çapemeniyê bi du zimanan û du zaravayên kurdî têne kirin û em ji îro pê ve bi xizmeta zimanê îşaretan çalakiyên xwe yên ragihandinê derdixin ser sê zimanan.
- Dema ku parvekirinên hevdem li ser platformên X, Instagram, Facebook, Youtube, Tiktok û Telegramê hatin kirin, di salekê de 150 milyon danûstandin hatin wergirtin.
- Hilberînên billboard, raket, ekranên LED, karên çapkirinê, dîtbarên medyaya civakî û naveroka vîdyoyê li gorî hewcedariya serdemê xwe nû dikin û didomînin.
- Dema ku karûbarên nûçe, wêne û dîmenan ên di yekîneya me ya çapemeniyê de bi kalîteya ajansê têne rêvebirin, di salekê de 10 hezar û 400 nûçeyên me (ji bilî medyaya civakî) di çapemeniya herêmî û neteweyî de cih girtin.
- Hezar û 400 nûçeyên ku li ser malpera me hatin weşandin bi 859 hezar û 500 xwendinê re rekora hemû deman şikand.

# SEROKATIYA DAÎREYA AVAKIRIN Û BINESAZIYA BAJÊR

- Li ser rêya avakirinê ya Bulvara Mîr Celadet a 50 metre fireh, arizîkirina 17 avahî û 23 yekîneyên serbixwe hat temamkirin û xebata Bulvara Şêx Seîd hat destpêkirin.
- Deşta tomarkirî ya li Taxa Şemhane ya navçeya Sûrê û Kanîya Eyn-Kebîr a li navçeya Hênê hatin restorekirin. Ji bilî van, karên restorasyonê yên mekan û avahiyên dîrokî-çandî yên li bajêr didomin.

# SEROKATIYA XIZMETÊN PIŞTGIRIYÊ

- Aboneyên elektrîk, av û gaza xwezayî yên 870'î yên avahiyên xizmetê yên sazûmanê û qada berpirsiyariya wê bi rêkûpêk hatin şopandin û fatûreyên wan hatin dayîn.
- Lênêrîn-tamîr, paqijkirin û tedarîkkirina avahiyên xizmetê hatin meşandin.


AMED
Bajarê Bîr û Evînê
/diyarbakirbld
diyarbakir.bel.tr